Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1224 24-Mijdar-2024 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ rojnameyaronahi @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com Rojnameya Ronahî +963 984 370 218

# Li ser seramîkan xêzdike û çanda Kurdî diteyisîne



**Benaz Rauf weke jinek şêwekar, ji bo parastina çanda Kurdî dest bi çêkirina seramîkan kiriye, nêzî 16 salan e li bajarê Silêmanî bê westan karê nexşandina seramîkan dike.**

Hunera seramîk hunerek kevin a dîroka Kurdan e û bi awayek şêwekarî tê kirin. Ji serdema kevin heta niha neteweya Kurd ji bo parastina çanda xwe, seramîkan nexşandine. Benaz Rauf ku beşa şêwekariyê li peymangeha hunerên ciwan di sala 1998'an de temam kiriye, nêzî 25 salan e bêwestan karê nexşandina seramîkan dike. Di sala 1999'an de weke mamoste li dibistana Çarqurne ders daye. Piştre li peymangeha hunerên ciwan a Ranyayê nêzî du salan dersa seramîkê daye. Piştre di sala 2009'an de li bajarê Silêmanî ji bo parastina çanda xwe dest bi karê seramîkê kiriye. Çend pêşangehên seramîk vekirine. Li Rojhilatê Kurdistanê beşdarî çar pêşangehên navneteweyî bûye. Tevî hemû rêgirî û astengiyên li hemberî karê wê, kêrhatiya wê ya xebatê bûye sedem ku karê xwe berdewam bike û şopa xwe di hunera seramîkan de bihêle.

**'Hunera seramîk hunereke taybet e'**

Benaz Rauf da zanîn ku beşa şêwekarî ya peymangeha hunerên ciwan temam kiriye, sala 1997-1998'an xwendina xwe temam kiriye û di sala 1999'an de dest bi karê şêwekarî û çêkirina seramîkan kiriye û got: "Min du pêşangeh vekirin her wiha li Rojhilatê Kurdistanê beşdarî çar pêşangehên navneteweyî bûm. Piştî min dîplomaya hunera seramîk girt, min dest bi karê seramîkê kir. Karê seramîkê hunereke taybet e, destpêkê bi fikir dest pê dike, dîzaynkirina kar, hilbijartina şêweyên wê û qebareyê mezinahî û firehî û piştre hilbijartina şêwazê reng û nexşên wê û dizayna wê dest bi çêkirina wê tê kirin."

**'Hemû dîzaynên seramîkê li gorî çanda Kurdî ne'**

Benaz Rauf wiha behsa şêwaz û çêkirina karê seramîkê kir û got: "Seramîk karekî giran e divê destpêkê fikir û nexşên wê dîzayn bikim, qiyasê wê ya firehî û dirêjî û şêwazê nexşê diyar dikim û piştre dest bi anîna malzemeyan ji bo temamkirina seramîkê dikim. Ji Kurdistan û derveyî Kurdistanê axa wê tînim. Ger rengê wê axê sor be, ji bo karê me guncaw e, destpêkê em wê axê paqij dikin, bi riya avê dikin herî û piştre şêwe didin seramîka xwe û piştre em dixin firinê û sor dikin û piştre karê ciwankarî û dîzayna wê dikin. Anîna nexşan û dîzaynên min ji malzemeyên çand û nexşên çanda Kurdî pêk tên her wiha bi riya daxwazên hemwelatiyan jî ez nexşan çêdikim."

**'Divê hunera seramîk di her malê de hebe'**

Benaz Rauf destnîşan kir ku hunera seramîk pêwîstî bi mayînê heye, ev kar ji bo ciwanan karekî girîng e û bi riya nexşan diyar dibe ku ka hunera seramîk hunera jinan e yan a mêran e û wiha got: "Ji bo parastina hunera seramîk pêwîstî bi pêşkêşkirina agahiyan heye. Divê bi riya gotinên dersa seramîk ji bo ciwanan em hunera seramîk zindî bikin. Lê belê niha ji ber xirabûna rewşa aborî firotina berhemên seramîk kêm bûye. Tevî xercek zêde lê çêkirina wê diçe jî em bi nirxek kêm difiroşin, da ku hunera seramîk bê naskirin û di her malê de karê seramîk hebe. Divê karê seramîk û hebûna wê di her malê de weke çandek hebe da ku were parastin. Ji demên berê ve jinan bi riya qolye û nexşkirina li ser qolyeyên zîv ev kar dikirin. Ez karê xwe bi hemû hêz û kêrhatiya xwe dikim ji bo berhemên xweşik derbixim. Gelek caran nikarin karê xwe bidim nasîn loma divê ez di vî warî de hewil bidim. Her wiha di civaka me de gelek rêgirî li hemberî jinan tê kirin ev jî dibe sedema jinavbirina hunera me. Em jin bi riya karên çandî dikarin hunera Kurdî pêş bixin." **NÛ JINHA**

# Keda jinan û xalîçeyên Rojhilat

**Li her herêmeke Rojhilatê Kurdistanê motîfên ku bi dest hatine nexşandin bi taybetî yên girêdayî herêmê hene û bi nav û deng in. Tayê ku di destên jinan de şêwe digre, vediguhere berhemên hunerî.**



Jinên ku ji demên berê ve heta îro vî karî dikin û tînin ba hev, ji bo siberojê mîrasa çandî dihêlin. Gundê Bîsaran yek ji van cihên ku ev mîrasa çandî lê tê jiyîne. Ciwanên gund tiştên ku ji mezinên xwe girtine bi nûbûnên xwe bi pêş xistine. Jin bi dahata ku ji vê mîrasa çandî bi dest dixin perwerdeyên xwe didomînin.

Dema li gund karekî dest pê dike, ji ber derdor biçûk e û zêde cudahî tune ne, gelek jin bi lezgînî dest bi wî karî dikin. Di encama vê de, li her gundî beşeke diyar ê hunera dest an jî cureyê hunerê derdikevin pêş. Mînak, li herêma Hewraman hunera hûnandina sepetan, çêkirina xaliyan, kilîm û çêkirina pêlavan hunerên bi destan ên xwecihî hatiye pêşxistin, li Bîsaranê jî di nava 15 salên dawî de tabloyên ku bi xaliyan çêdibin bi nexşên geometrîk tên çêkirin.

**Bi hev re xaliyan çêdikin**

Ev tablo, bi bihayên zêde tên firotin lê belê jinên ku xaliyan çêdikin, her dem bihayê ku heq dikin nagirin. Jinan bi giştî beşeke rojê ji bo vî karî veqetandine, ji derveyî berpirsyariyên xwe yên din ên gund, perwerdeya xwe jî didomînin û ev kar ji bo wan çavkaniyeke din ya dahatê ye. Tabloyên xaliyan, ji aliyê jineke li gund ve li yên din tên parvekirin û piştî ku kar temam dibe, ev kes hemû karî kom dike û digre, radestî kesê/a ku berê pêre li hev kirine dike û pereyê ku jinan heq kiriye dide wan.

**'Ji bo debara xwe ez xaliyan çêdikim'**

Ji ciwanên gund Sena Aliramayî diyar kir ku gelê herêmê di her mijarê de zîrek e û wiha got: "Ez ji ciwanên gundê Bîsaran im û bi qasî ku min ji mezinên xwe bihîstiye, mirovên li vê derê dijîn her dem gelek zîrek bûne. Ez ji bo pêkanîna dahata xwe xaliyan çêdikim, ev nêzî sê, çar salan e vî karî dikim. Jinên li vê derê, li gel mêran gelek dixebitin."

**Herî zêde jin xaliyan çêdikin**

Sena Aliramayî da zanîn ku ji bo xerca dibistanê derbixe xaliyan çêdike û wiha domand: "Bîsaran li gorî gundên din, gundekî mezintir e. Belkî balê nekişandibe lê belê li vê derê herî zêde jin xalî û kilîman çêdikin. Em nêzî 50 jin bi hev re xaliyan çêdikin. Dema havîn û biharê em diçin dibistanê, ji bo xerca derbixim kar dikim. Li vê derê gelek zarokên ku dixwînin hene. Ew hem perwerdeyê dibînin, hem jî ji bo karên cuda yên gund dixebitin. Hinek caran ji baxçeyan tên li dibistanê dersê dibînin. Lê belê herî zêde zarokên keç perwerde dibînin bi rastî gelek bi aqil û zîrek in."

Sudoku: Bersiv 15

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | 7 | 2 | 3 | 4 | 8 | 9 | 6 | 5 |
| 6 | 4 | 9 | 2 | 5 | 1 | 7 | 8 | 3 |
| 5 | 3 | 8 | 7 | 6 | 9 | 2 | 1 | 4 |
| 4 | 9 | 7 | 6 | 8 | 3 | 1 | 5 | 2 |
| 3 | 8 | 5 | 9 | 1 | 2 | 4 | 7 | 6 |
| 2 | 1 | 6 | 4 | 7 | 5 | 3 | 9 | 8 |
| 9 | 5 | 4 | 8 | 3 | 7 | 6 | 2 | 1 |
| 7 | 6 | 1 | 5 | 2 | 4 | 8 | 3 | 9 |
| 8 | 2 | 3 | 1 | 9 | 6 | 5 | 4 | 7 |

Sudoku:Pirs 16

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 7 | | | | | 3 | 9 | | |
| | | 2 | | 1 | | 6 | 5 | |
| | 4 | | | | 2 | | | 1 |
| 5 | | | | | 7 | | | |
| 3 | 6 | | 2 | | 4 | | 9 | 5 |
| | | | 6 | | | | | 8 |
| 4 | | | 9 | | | | 6 | |
| | 1 | 3 | | 7 | | 8 | | |
| | | 9 | 3 | | | | | 2 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Hilê wî danî ser milê wî:**
- Bi heman wateyê.

**Kaya hev dêran:**
- Hev êşandin; hev pîs kirin; tiştek nema ku ji hev re negotin; tiştek bi şûn ve nehiştin.

**Ketiye devê xelkê:**
- Rezîl bûye; her kes behsê dike.

**Ket koda kemaçê:**
- Her kes li ser kêmayiyên wî diaxive; bû pêkenokê civakê. (Dema kêmayiyên yekî tên dîtin û li nava civakê tên gotin hingê jê re tê gotin)

Ketiye ser zar û zimanan.
- Her kes li ser diaxive. (Dema ji bo kirina tiştek nebaş mirovek dikeve devê civakê, hingê tê gotin)

**Kêlika wî şkand:**
- Rezîl û riswa kir.

**Kirasê wî di ser qûna wî de anî:**
- Şermezar kir; rezîl û riswa kir.

**Mala wî li kerê kir:**
- Hetikand; rezîl kir; kêmayiyên wî tev eşkere kirin.

**Nava wî hilanî:**
- Rezîl û riswa kir; şermezar kir.

**Pê li dûvê wî kirin:**
- Nuqteya wî ya lewaz dîtin; sûcê kirî dan rûyê wî; wisa kirin ku êdî nikaribe biaxive.

**Sa berî hev didin/sa berdidin hev:**
- Navbera wan pir ne xweş e; hev rezîl û riswa dikin.

**Sed bav ji hev re çêkirin:**
- Hev êşandin; hev pîs kirin; tiştek nema ku ji hev re negotin; tiştek bi şûn ve nehiştin.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## 'Bi hezaran pênûs dê heqîqetê eşkere bikin'



Rojnamevan Gulîstan Gumuş diyar kir ku dewleta Tirk a dagirker ji bo ku dengê heqîqetê biçewisîne û polîtîkayên qirêj ên li ser civakê pêk bîne, rojnamevanan dike hedef, bi işkence û qetilkirinê dixwaze wan bê vîn bihêle.**R-3**

## 'Fêmkirin û şîrovekirina pêvajoyê bi xwendina Rêber Apo pêkan e'



Akademiya Zanista Civakî ya Rêber Apo li tavahî Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi armanca xwendin, têgihêştin û piratîkkirina fikrê Rêber Abdullah Ocalan ên ku wî di pirtûk û pareznameyên xwe de anîne ziman; dibe şêwaza bingehîn ji qada perwerdê û gelên herêmê re.**R-4**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1224 24-Mijdar-2024 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

## Civaka Êzdî polîtîkayên dijmin vala derdixe



Hevserokê Desteya Rêveber ya Rêveberiya Xweser a Şengalê Xwedêda Ilyas diyar kir ku di nava salekê de 100 hezar Êzdî vegiriyan Şengalê û wiha got; "Civaka Êzdî siyaseta koçberiyê ya ku PDK`ê û dewleta Tirk a dagirker didin meşandin, vala derdixe."**R-6**

# JIN DÎROKÊ JI NÛ VE DINIVÎSE

**Roja 25'ê Mijdarê, Roja Têkoşîna Li Dijî Tundiya Li Ser Jinê ye ku di şexsê her sê xuşkên Mîrebal de pêş ket, ji bo tevahî jinan bû mîrateya têkoşînê. Jinan di dîrokê de her dem li hemberî pergala desthilatdar û hişmendiya zayendperest a mêran têkoşîn meşandiye. Li hemberî zilm û neheqiyê serî netewandiye, xwe bi rêxistin kiriye û têkoşiyaye. Berxwedana jinan di roja îro de jî li ser heman xetê, heman armanc û felsefeyê tê meşandin.R-2**



## 'Huner rehetiyekê dide rihê mirov'



Hunermenda jin Sîdar Ibrahîm diyar kir ku xeyal û hezkirina wê ji hunerê re bû mîna findekî jê re da ku rêya hunerê berdewam bike û wiha got: " Hêviya min ew e ku di demên pêş de ez wek jineke kurd li her derê bigerim û dengbêjiya xwe belav bikim."**R-7**

## 'Pêwîste Netewên Yekbûyî alîkariya Rêveberiya Xweser bike'



Şêxmûs Ehmed destnîşan kir ku li beramberî tevahî şert û mercên dijwar Rêveberiya Xweser bi erka xwe ya mirovî radibe û wiha got: "Pêwîste hemû rêxistinên navnetewî bi erkê xwe rabin û piştgirî bidin Rêveberiya Xweser, ji ber ku ev erkekî mirovî ye."**R-5**

# Bi fikrê Rêber Apo jinê mohra xwe li dîrokê xist

Rastiya dîroka roja 25'ê Mijdarê, roja tekoşîna li dijî tundiya li ser jinê ku di şexsê her sê xwûşkên Mîrabal de pêşket ji bo tevahî jinan bû mîrateya tekoşînê. Jinan di dîrokê de her tim li hemberî pergala desthilatdar û hişmendiya zayendperest ya mêr tekoşîn meşandin.

**Amara Baran/Qamişlo**

Roja 25'ê Mijdarê, roja tekoşîna li dijî tundiya li ser jinê ku, di şexsê her sê xwûşkên Mîrabal de pêşket ji bo tevahî jinan bû mîrateya tekoşînê. Jinan di dîrokê de her tim li hemberî pergala desthilatdar û hişmendiya zayendperest ya mêr tekoşîn meşandiye. Li hemberî zilm û neheqiyê serî netewandiye. Tekoşîn, xwe rêxistin kirin û berxwedana jinan di roja îro de li ser heman xetê, heman armanc û felsefeyê tê meşandin.Tekoşîna ku di armanca xwe de zelal be, tu astengî nikarin wê bidin rawestandin.




### 25 mijdarê bi kuştina her sê xwişkên mîrabel hat sembolîzekirin

Roja têkoşîna şîdeta li hemberî jinê bi sê xwîşkên têkoşer ku bi Mîrabel tên bi nav kirin di hêla Komara Domînînk ve hatin kuştin an jî qetilkirin ve tê sembolîzekirin. Di wê demê heya roja me ya îro têkoşînek tê dayîn û her û her di rojevê de tê girtin.

Xwişkên Mirabal - Patria, Minerva û María Teresa – dibin yek ji mînakên pêşengtî û israra jinê di doza rizgariya jin û civakê de. Wan di salên 1950'an de tevlî têkoşîna 'Tevgera 14 'ê Hezîranê' li dijî dîktatoriya faşîst a Trujillo li Komara Domînîkî bûn. Wekî têkoşerên azadiyê ew bi nasnavê Las mariposas, yanî Perperîkan ji aliyê gel ve dihatin nasîn û hezkirin. Wan tevî hevreyên xwe hewldidan civakê hişyar bikin û bi rêxistin bikin da ku tirs û bêdengiya li hemberî zext û kedxwarî, êşkence û kuştinên siyasî bişikînin. Herçiqas Xwişkên Mirabal ji aliyê leşkerên Trujillo hatin girtin, wan li bin êşkence û tecawûzên leşkeran gavek paşve neavêtin, ti carî xiyanet qabûl nekirin. Di encama hevgirtin û zextên navneteweyî de hatin berdan. Vîna berxwedanê û wêrekiya Perperîkan hem baweriyê da gel hem jî rejîma faşîst tirsand. Lewma dîktator Trujillo di 25'ê Mijdara 1960'an de fermana revandin û kuştina Patria, Minerva û María Teresa da. Lê belê şehadeta Xwişkên Mirabell di dawiyê de bû sedema vêxistina çirûsa serhildana gel a ku di Gulana 1961'an de bi kuştina Trujillo gihand lûtkeya xwe. Bi ruxandina dîktatoriya faşist a ku 31 sal bi piştgiriya DYE qirkirinên hovane li ser gel û jinan meşandibû, gelê Komara Domînîk tola Xwişkên Mirabel û 30 hezar şehîdên xwe hilda. Tevgerên jin li Amerika ya Latîn û cîhanê jî li xwedî bîranîna ked û têkoşîna van jinên pêşeng derketine û roja 25'ê Mijdarê wekî Roja Navneteweyî ya Têkoşîna li Dijî Hemû Cureyên Tundiya Li Ser Jinê îlan kirine.

Piştî şehadeta Xwişkên Mirabal berxwedan û serhildanên jinê li hemberî rejîmên faşîst û hemû cureyên tundiyê yên serdestiya zilam di asta cîhanê de tu car kêm nebûn û hê jî berdewam dikin. Bi taybet jî di ronahiya şoreşa Kurdistanê de ji salên 1990'ê ve rûpelên nû di dîroka têkoşîna azadiya jinan de hatine nivîsandin.

### Tekoşîna jinan a sedsala 21'ê gihaşt tevahî parzemîna

Têkoşîna jinan ya di sedsala 21'ê de gihiştiye tevahî parzemînên cîhanê. Doz û têkoşîna jinan gerdûnî bûye û astekê girîng jî qezenç kiriye. Ev yek bi xwe re riya çareseriyê jî di afirîne. Ev feraseta têkoşînê di jinan de hevgirtin, têkoşîn û berxwedaniyek hevbeş ya li hember pergala zilam jî daye pêşxistin.

Di tevahî sedsalan de jin berxwedanî dane meşandin, bi ti awayî pergala heyî ne pejirandine. Ev di hêla siyasî de, civakî de , hiqûqî de dibe û hwd. Di sedsala 20'ê de derketina Rêber APO bi taybetî jî li ser fikrê azadî, berxwedanî, têkoşîn û çanda jin-dayîk re ava kirina tevgera jinên Kurd mohra xwe li sedsala azadiya jin daye.

Paradîgmaya Rêber APO ya demokrasî, ekolojî û azadîxwaziya jinê re artêşbûyîna jinê li ser bingeha parastina cewherî, rêxistinbûyîna jin, partîbûyîna jin û bi ilmê jin jineolojî re pêşengtiyek dîrokî, kurevî û gerdûnî ava bûye.

### Jin li hember pergala faşîst şerê parastina cewherî dimeşîne

Jinên Kurd bi feraset û hişmendiya azadiya jinê re, bi feraseta parastina cewherî re, parastina nirxên jin, nasnameya jin, çand û civaka exlaqî û polîtîk re li hember pergala faşîst, xwînxwar û sondxwarê qirkirina gelê Kurd dewleta faşîst ya Tirk û hikûmeta AKP-MHP ya nûnertiya hişmendiya pergala pênç hezar salan dike şerê parastina cewherî dimeşîne. Pergal û hişmendiya zilamê dagirker, qirker bi xwe re talan, îmha, tunekirin, kuştin, xirabkirin û tûne bûyînê tîne, mînaka herê şînber jî faşîzma ku DAÎŞ di pêşengtiya faşîzma Erdoxan û tevahî hêzên hegemonîk de pêktîne mirov dikare bi awayekê şenber bibîne. Jinên Kurd li ser bingeha parastina cewherî, şerê ku di tu demên dîrokê de ne hatiye dîtin dide meşandin. Ev şer jî li ser bingeha hişmendiya parastina rewa, parastina nirxê tevahî civaka exlaqî û polîtîke. Jinên Kurd ev şerê parastina rewa di tevahî qadê jiyanê de, di birdozî de, di siyasî de, di hiqûqî de, di diplomasî de, di çandî û nasnameyî de dide meşandin. Bêguman ev şerê parastina rewa di encamên bedelên giranbiha de hate avakirin.

### Pergala serdet a zilam xwe li ser qetilkirin û qirkirina jinê avakiriye

Pergala serdest ya zilam bingehê zihniyeta xwe, bîrdozî û feraseta xwe ya dîktator a li dijî jiyana azad li ser bê îradekirina jinê, tundûtûjiyê, faşîzmê, qirkirinê, qetilkirin û bê wate kirina jin-jiyanê ava kiriye. Di her pêvajo û serdemên dîrokê de zihniyeta desthilatdar û pergala wê ya sedest bi rêbazên kirêd yên ji exlaq û nirxên mirovahiyê dûr li dijî îradeya jinan û civakê daye pêşxistin. Di vê serdemê de alozî û qirîzên civakî, siyasî, çandî û exlaqî yên ku mirovahî pêre rû berûye bingeha xwe ji rastiya pergala modernîteya kapîtalîst û serdestiya mêr-dewletê digre. Li hemberî rastiya rû reş ya mêr-dewletê û pergala wê ya serdest jin nema serî ditewînin. Têkoşîna jinan ya di vê qonaxa dîrokî de pêşdikeve û vê di pergala serdest de metirsiyekî mezin daye avakirin. Sedema dijwariya êrişên li ser jinan û tundiya tê meşandin bingeha xwe ji vê heqîqeta jinan ya êdî jê veger nîne digre. Îradeyekî bihêz, rêxistinî û tekoşînekî hevpar ya jinan dikare li ber vê hêrs û êrîşa pir alî ya mêr-dewletê rabe.

# 'Mala Jin xwedî li jin û civakê derdikeve'

**Dîlan Mulhim/Qamişlo**

**Rêvebera Mal Jin Behiya Mûrad da zanîn ku piraniya pirsgirêkên ku tên mala Jin, pirsgirêkên civakî yên girêdayî tundiyê û pirsgirêkên di navbera jin û mêr de ne û got, "Em weke Mala Jin hewl didin ku hemû pirsgirêkên civakî çareser bikin û xwedî li jin û civaka xwe derkevin."**

Bi destpêkirina şoreşa Rojava, bi armanca rizgariya jinê ji bendên koletiyê Mala Jin hat vekirin. Herwiha ev sazî giringî da mefê jinê û hewl da ku mafê wê ji kevneşopiyên civakê yên paşverû û hişmendiya nijadperest, biparêze. Mala Jin di 20'ê Adara 2011'an de xwe yekem car li bajarê Qamişloyê bi rêxistin kir û şaxên xwe li tevahiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê belav kir.

Di derbarê xebatên Mala Jin de, rêvebera Mala Jin a bajarê Qamişlo Behiya Mûrad ji rojnameya me re axivî.

### 'Mal Jin xwedî li jin û civakê derdikeve'

Behiya Mûrad da zanîn ku pirsgirkên civakî piraniya wan yê jin û mêrin û wiha got: "Pirsgirkên ku îro em dibînin bi giştî pisgirêkên malbatî ne, yên wekî; zewaca temen biçûk, jinên ên ku ji ber işkence û tundiyê ji mal direvin. Herwiha hin caran ji aliyê kesên ne diyar ve li ser mediyayê civakî gef li jinan tê xwarin. Em ji aliyê xwe ve van jinan dikin cihê parastinê heta ku em pisgirêka wan çareser bikin. Çareskirina van pirsgirêkan mala jinê ji her alî ve dibe bersiv û pirsgirêkan çareser dike, kesên ku pirsgirkên wan di mala jin de çareser nebin em wan rêdikin dadgehan. Me komîte ava kirine, komîteyên me jî ji Mala Jin, Rêxistina Sara û Kongra Stare pêk tê. Em li gorî derfetê xwe û heta ku ji destê me tê, em van pirsgirêkan çareser dikin."

### 'Armanca Mala jin avakirina civak û malbateke dîmokrat e'

Behiya Mûrad da xuyakirin ku deriyê Mala Jin ji tevahiya civakê re vekirîye û wiha pê de çû: "Hin jin hene tên gazinên xwe dikin û hin jî ji tên ji bo ku karekî ji xwe re peyda bikin. Civak û jin, Mala Jinê ji xwe re riya çareseriyê dibînin. Herwiha armanca Mala Jinê civak, malbatek wekhevî û dîmokratî e, dema ku em lihevkirin di navbera jin û mêr de çêdikin."

### 'Di cîhanê giştî de pirsgirêkên civakî tên jiyankirin'

Rêvebera Mala Jin Behiya Mûrad di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Piraniya pirsgirên zewacê ew ku bi temen biçûk dizewicin, ji her du aliyan çi jin û çi mêr be pirsgirêk û alûzî dedikevin. Di cîhanê giştî de pirsgirêkên civakî tên jiyankirin. Herwiha di vê mihê de me ji bo roja



cîhanî ya têkoşîna li dijî tundiya li ser jinê semînerek li dadgehê hat dayîn û zedeyî 100 jin û mêr tê de hazir bûn. Bi rêya van semîneran em dixwazin ku gel hişyar bikin, ji ber ku jin ji aliyê mêr ve tê bindestkirin. Di heman demê de, di plannameya me ya dema pêş de heye ku em di dibistanan de jî panêl û semîneran ku girîdayî hişyarkirinê ne bidin xwendekaran."



# 'Huner rehetiyekê dide rihê mirov'

Hunermenda jin Sîdar Ibrahîm diyar kir ku xeyal û hezkirina wê ji hunerê re bû mîna findekî jê re da ku rêya hunerê berdewam bike û wiha got: " Hêviya min ew e ku di demên pêş de ez wek jineke kurd li her derê bigerim û dengbêjiya xwe belav bikim."

**Ayşa Silêman/ Qamişlo**

Sîdar Ibrahîm Zarokatiya xwe li gundê Xirbet El-Camûs derbaskiriye, wê bawernameya amadehî bi zimanê erebî wergirtiye. Piştî bidawîbûna xwendina amadehî Akadimiya Hunerî li bajarê Tirbespiyê hat vekirin û wê jî cihê xwe wek xwendekar di akadimiyê de girt. Dema piçûk bû stran digotin lê tu carî xeyal nedikir ku wê rojek ji rojan bikaribe vê hunerê li derdorê balav bike.

Di derbarê jiyan û astengiyên ku hunermenda jin Sîdar Ibrahîm têre derbas bûye ji Rojnameya me re axivî.

### Kurte jiyana Sîdar Ibrahîm

Sêdar Ibarêm diyar kir ku di zarokatiya wê de bavê wê gelek bû alîkar pê re û ew kesê yekem bû ku destek dayê da ku derbasî navendên hunerî bibe li bajarê Hesekê û wiha got: "Temenê min 13 Salî bû, ez çû navenda Xabûr ya li bajarê Hesekê, tevî ku derfet zêde nebûn jî li ew wek gavek destpêkê bû ji bo pêşketina vê hunerê. Li wir ez tevlî girûpan dibûm û min karî dengê xwe li pêş bixim. Paşê ez çûm Akadimiya Hunerî û beşa mûzîkê bi taybet



ya deng salekî min xwendin. Ew sal ji bo min salek dagirt gavên serkeftî bû, li wir fêrî notên deng û zanistên cûda bûn. Piştî bidawîbûna akadimiyê ez hatim bajarê Qamişlo û li wir derbasî Tevgera Kevana Zêrîn bûm, 4 sala wek koma kevana zêrîn a jin em bihev re xebitîn û tevlî gelek festîval û şahiyan ji bûn.

Her wiha Piştî vê xebatê ez carek din vegeriyam bajarê Hesekê û li wir koma zarokan a bi navê koma Eşbalan li navenda Xabûr da avakirin, tenê ev kom ji bo ritim, deng û stranên filklor bû. Min nêzî 2 salan ev kar berdewam kir, êdî zewicîm û carek din min berê xwe da bajarê Qamişlo. Hevjînê min gelekî bi min re bû alîkar da ku ez vê riya xwe berdewam bikim. Hevjînê min sînema xwendiye û min jî mûzîk xwendiye, lome me biryar da ku em bi hev re navendekî vekin. Ev nêzî 2 sala ye min û hevjînê xwe bi hev re navenedek vekir û em him konsêrt him jî şahiya li dardixin, heya niha em divê navendê de xwebexşin, armanca me ew e ku em derfetê bidin zarokên xwedî xeyal û wan pêş bêxin."

### 'Huner rehetiyekî dide rihê mirov

Sîdar Ibrahîm da zanîn ku wê rehetiyek di hunerê de dît loma ji piçûkanî ve eşqa wê jê re hebû û wiha got: " Huner dibû amûrek ji min re da ku ez rihê xwe arambikim, mûzîk jiyana herî xweşe ya ku mirov têre derbas dibe. Xwesteka min hebû ku ez li akadimiyê xwe fêrî sazê jî bikim, lê derfet nebû. Ji ber ku xwesteka min hebû min karî ez xwe bixwe fêr bikim. piştî vekirina me ji navendê re min xwest ku alavek bi min re hebe dema ez bistirênim ez lêbixim. Niha ez li Ekolêlê dixim ew gelekî bi min re dibe alîkar dema ku ez stranan dibêjim. Astengiyên ku derdikevin pêşiya hemû hunermendên Rojavayê Kurdistanê ew e ku derfetên mamosteya li vir nînin. Ev 15 sal in ku ez vî karî dikim lê hîn jî derfet ji bo min gelek kêmin û hewcedarim ku hîn zêdetir waneyan bibim da ku ez bêtir xwe pêş bêxim. Derfetên heyî



jî bêtir aliyê madî digrin dest, hêviyên mirov qutdikin, yanî qedirê hunerê li vir gelek kême."

### Armanca me pêşxistina rihê hunerê ye

Sîdar Ibrahîm di berdewamiya axaftinên xwe de anî ser ziman û wiha got: "Min, hevjîn û hevalekî me ji serê kaniyê ye ev nêzî 2 sala ye me girûpa yekpar vekiriye, me gelek astengî dîtin heya ku ev girûp hat avakirin. Lê piştî hemû zehmetiyan dema em keda xwe dibînin em gelek kêfxweş dibin. Her sal em derdikevin konsêrta li dardixin. Herwiha kesên ku tên vir derfetên wan nînin di aliyê hunerê de ku bikaribin tevlî koman bibin yan bi hunermendan re derkevin. Em li vir kom dibin him xwe li pêş dixin him jî hunera xwe derdixin. Di navendê de em bêtir guh didin hest û xwesteka zarokan, loma em gelekî xwe bi aliyê madî ve girê nadin, armanca me ew pêşxistina rihê hunerê ye, em pirova çêdikin ji bo fastîvala Yekpar û hemû hewildanên me hene ku em bikaribin rihê hunerê di civakê de vejîn bibikn."

Hunermenda jin Sîdar Ibrahîm dawî li axaftinên xwe anî û wiha got: "Hêviya min ew e ku di demên pêş de ez wek jinek kurd li herderî bigerim û dengbêjiya xwe li herderî belav bikim, ev yek mîna xewn û xeyalekiye ji min re. Daxwaza min ji hemû ciwan, jin û zarokan re ew e ku yekpar ji bo xewin û xeyalên hunerî ji wan re vekirî ye, em ê destekê bidin wan da ku bikaribin hunera xwe li pêş bixin."

# Arşek Baravî: Parastina ziman erkekî welatparêzî ye

**Dilovan Kêfo/Amûdê**

**Nivîskar û lêkolînerê zimanê kurdî Arşek Baravî diyar kir ku şoreşa pêşxistina zimanê kurdî dewam dike û piştî demeke dirêj ji zehmetî û çewisandinê, zimanê kurdî di qonxeke pir girîng de derbas dibe û gavên girîng tên avêtin.**

Dema ku mirov dîroka gelekî binirxîne pêwîste dîroka zimanê vî gelî jî binirxîne. Ji ber ku dîroka gel û zimanê gel yek in. Piştî şoreşa 19'ê Tîrmehê dest pê kir, li kêleka wê jî şoreşa zimanê kurdî li Rojava dest pê kir û di dema niha de ew bûye zimanê perwerdeyê li dibistan, peymangeh û zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûriyû û bi awayekî berbiçav pêşketiye.

Derbarê girîngiya zimanê kurdî ji bo gelê kurd û asta pêşketina ziman li Rojavayê Kurdistanê Nivîskar



û lêkolînerê zimanê kurdî Arşek Baravî ji Rojnamey me re axivî.

Arşek Baravî di destpêka axaftina xwe de wiha got: "Bi destpêkirina Şoreşa Rojava re yekem gav di aliyê pêşxistina zimanê kurdî de me avêt, çêkirina pirtûkan bi zimanê kurdî bû. Bi saya berxwedana YPG û YPJ'ê şoreşa ziman jî hat parastin. Destpêkêî kesê di xebatên pêşxistina zimanê kurdî de cihê xwe girtin, kesên zimanzan yên mîna Samîtan, Bahoz Baran û Celalê Nîzamî û hwd."



### 'Xwendina zarokan bi zimanê kurdî xwena me ya sedê salan bû'

Baravî di dewama axaftina xwe de behsa pêvajoya pêşketina zimanê kurdî kir û wiha got: "Di 11 Mijdara sala 2011'an de navande zimanê kûrdî li bajarê Amûdê hate vekirin û hejmarên pir mezin tevlî wê bûn, di wê demê de em gelekî kêf xweş bûn bi hatina wan û me wan amedekirin ji bû ku bibin mamosteyên zimanê kûrdî . Piştî wê ew mamoste derbasî dibistanan bûn û zarokan fêrî ziman û wêjeyan wan dikirin, bi vî aweyî pêvajoya pêketina zimanê kurdê dest pê kir.Piştî wê peymangeh û zanîngehê me jî hatin avakirin û salane bi sedan xwendekar ji wan derdiçin. Ev yek jî xwena me ya dehê salan bû. Neyara û dijminê gel kurd çiqas xwestin zimanê me qir bikin lê bi serneketin. Zarokên me pêşeroja me ne û zêdebûna pirtûkên kurdî jî deolemendiya zimanê me ye.

### 'Parastina ziman erkeke welatparêzî ye'

Nivîskar û lêkolînerê zimanê kurdî Arşek Baravî da zanîn ku hebûna zimanê kurdî hebûna gwelê kurd e û wiha qedand: "Divê em xwedî li şoreşa zimanê kurdî derkevin, em nehêlin ku siyaseta dagirkeran bandorê li me bike, Pêwîste em ji zimanê xwe hezbikin û biparêzin. Ji bo ku nifşên piştî me bên spasiya me bikin ku me hebûna wan bi parastina zimanê wan yê dayikê parast. Hebûna zimanê me hebûna me ye û parastina wê jî erkekî welatoparêzî ye. Pêwêste ev gavên pêroz ku di şoreşê de hatine avêtin bê parastin û bidomin."

# Civaka Êzdî polîtîkayên dijmin vala derdixe

Hevserokê Desteya Rêveber ya Rêveberiya Xweser a Şengalê Xwedêda Ilyas diyar kir ku di nava salekê de 100 hezar Êzdî vegiriyan Şengalê û wiha got; "Civaka Êzdî siyaseta koçberiyê ya ku PDK`ê û dewleta Tirk a dagirker didin meşandin, vala derdixe."

**Avêsta Menaf/Qamişlo**

Di 3'ê Tebaxa 2014`an de çeteyên DAIŞ`ê êrişî herêma Şengalê ya Başûrê Kurdistanê kirin. Piştî êrişê pêşmergeyên PDK`ê çeperên xwe berdan û rê li pêşiya DAIŞ`ê vekirin ku derbasî Şengalê bibin û dagir bikin. Di encamê de komkujî pêk hat û bi hezaran Êzîdî hatin kuştin û nêzî 5 hezar jin û zarok hatin revandin, di heman demê de welatiyên ku bi maşîneyan û yên ku bi meşê jî derketin berê xwe dane çiyayên Şengalê. Piştî rizgarkirina Şengalê ji aliyê YPŞ û YJŞ'ê ve, roj bi roj gelê Şengalê vedgere ser axa xwe. Li gorî agahiyan ku Rojnemeya me girtî 100 hezar kes vegiriyane Şengalê û li ser axa xwe.

Di vê çarçoveyê de Hevserokê Desteya Rêveber ya Şengalê Xwedêda Ilyas ji Rojnemeya me re axivî.



**'Heya niha mîna Jinosayît nehatiye qebûlkirin û wekî komkujî nahesbînin'**

Xwedêda Iliyas di destpêka axaftina xwe de wiha got: "Pêwîst e ku gelê me bîrewer û xwedî zaniyarî be. Em wekî Rêvberiya Xweser dema ku em dibînin rêjeyek ji gelê me vedigere herêmê kêfxweş dibin, bi dilekî gerim wan pêşwazî dikin, ji ber ku ev gel gelê me ye û em neçarin ku xwedî li wan derkevin, her wiha em bibin mal û star ji koçberên xwe re. Di heman wextî de rêjeyek ji gelê me yên Êzidî koçî welatê derve bûn û heya niha dewama jiyana xwe li welatên xerîbiyê dikin. Niha alîkariya ku Netewên Yekbûyî ji bo gelê me yê Şengalê re dike, ji nîvî zêdetir rayedarên Başûrê Kurdistanê ji bo berjewendiyên xwe bi kar tînin. Dewleta Îraqê jî di vê derbarê de gelek kêmaniyên wê hene, heya niha komkujiya Şengalê mîna Jinosayîta qebûl nekirye û wekî komkujî nahesbîne, ji bo vê yekê pêwîst e hisab ji berpirsê sereke yê fermanê were xwestin. Îro jî dixwazin careke din fermana 2014`an li ser serê gelê me yê ÊzIdî dubare bikin."

**'Rêveberiya Xweser bawerî di nava civakê da avakiriye'**

Xwedêda diyar kir ku civaka Êzîdî gelek êş û azar dîtiye, rastî gelek fermanan hatiye û wiha domand:"Rêveberiya me ya xweser di asteke mezin de xebatên xwe yên vegerandina penaberên Şengalê dide meşandin, di heman demê de şaredariya me bi karê xwe yê rojane ve radibe û karê xwe dide meşandin. Her wiha 13 şaredariyên me hene û hemû şaredarî jî ji bona dabînkirina pêdiviyên gel di nava kar û xebatê de ne. Ji xwe şaredarî erkê wê yê sereke bikaribe di civakê de hin guhertinan bide avakiri, ji ber ku civaka me ya Êzîdî gelek êş û azar dîtiye û rastî gelek fermanan hatiye, ji lewra hindek baweriya xwe hatiye şikandin. Angu karê ku Rêvberiya Xweser dide meşandin di asta serkeftinê de ye û civaka me ya êzîdî bi rêvberiya xwe ve girêdayî ye. Ji ber ku Rêveberiya Xweser bawerî di nava civakê da avakiriye û di nava dilê civakê de xwe bi cih kirin."

**Di sala 2024`an de nêzî 100 hezar Êzîdiyên şengalê vegeriyana axa xwe**

Iliyas di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: "Gelek kesên ku koçberî deverên cuda bûne, vedigerin. Her wiha rêveberiya Xweser ji bona vegera welatiyên Şengalê di nava kar û xebatê de ye. Ji xwe Rêveberiya Başûr bi salan e civaka me ya Êzîdî dixapand. Lê bi avabûna Rêveberiya Xweser hemû rastiyên civakê da avakirin û hat xuyakirin, di heman demê de roleke gelek girîng dane ser milê xwe û xwedî soza xwe derketin. Em jî li ser fikra Neteweya Demokratîk a ku Rêber Apo daye avakirin dimeşin, ji ber vê yekê gelê me xwe bi fikir û felsefeya Rêber Apo dide girêdan. Di sala 2014`an de dema ku fermana 74`an rûda nêzî 400 hezar însan koçber bûn û berê xwe dane Kurdistanê û derveyî kurdistanê. Di heman demê de 6 hezar û 400 kes çarenûsa wan ne diyar bû yê ku vegeriyan jî 3 hezar û 562 kes bûn. Di destpêka fermanê de nêzî 15 hezar kes bûn. 280 mirov di çiyayê şengalê de jî ji birça jiyana xwe ji dest dan, 890 kes jî bi birînên giran re rû bi rû man. Her weha di sala 2024`an de nêzî 100 hezar mirov careke din vegeriya şengalê û li ser axa xwe. Heya roja îro 80 hezar insanê me di kampan de jiyana xwe bi rêve dibin."

**'Pêwîst e ku di aliyê fikir de xwe kûr bike û rêvberiya welatê xwe bike'**

Hevserokê Desteya Rêveber ya Şengalê Xwedêda Ilyas di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Bêgûman saziya UN jî piştrast dike ku 6 hezar û 700 mirov ji aliyê saziya xwe daye vegerandin. Di heman demê de jî ji aliya dewleta Îraqê ve jî gelek kes hatin vegerand, civaka me dibîne û xwedî zanebûne ku her dem dixwaze vegere li ser axa xwe û bi rûmet jiyan bike. Di heman demê de di roja me ya niha de jî siyaseteke gelek zirav li ser gelê me yê Êzîdî tê meşandin, gelek cih hene ku dixwazin civaka me koçî deverên cem xwe bikin û wan bê stato bikin, gelê me yê Êzîdî siyaseta koçberiyê yê ku PDK`ê û dewleta Tirk a dagirker didin avakirin, vala derdixe. Civaka me jî pêwîst e ku di aliyê fikir de xwe kûr bike û rêvberiya welatê xwe bike."

# Li Şehbayê demsala komkirina zeytûnan bîranînên Efrîniyan nû dike

**Vîndar Roj/ Şehba**

**Ji dûrbûn û veqetîna dar û zeytûnên xwe yên ku bûne armanca komên çeteyan di Efrînê de, koçberên Efrînê li herêma Şehbayê bi hatina demsala komkirina zeytûnan, ji bo debara jiyana xwe dest bi çinîna zeytûnên herêmê kirine û weke demeke vegerîna li bîranînên zeviyên xwe pênase dikin.**

Weke me gelek caran behis kiriye ku herêma Şehbayê bi darên xwe yên zeytûn û fistiqan tê naskirin, ev dar yek ji berhemên bingehîn yên aboriya herêmê û civakê ne.

Efrîna ku bi darên xwe yên zeytûnan di giştî Sûriyê de dihate naskirin ku xwediyê zêdetirî 11 Milyon darên zeytûnê bû. gelê wê aşiqê zeytûn û şaxên darê wê ne, li ser wê bingehê demsala komkirina zeytûnan weke demsaleke pîroz dihate destgirtin. Koçberên Efrînê jî yên ku nêzî 7 sala ne ji herêma xwe koçber bûne, li herêma Şehbayê bi mijûlbûna bi zevî û çandiniyê re dabara jiyana xwe dikin. Her sal di demsala komkirina zeytûnên herêmê de gelê Efrînê xwe di nav de dibîne û dest bi çinîna mewsimê bi gelê Şehbayê re dikin. di aliyê din de ji ber piraniya gelê herêmê ji ber sedemên cuda ji herêmê derketine, qismeke mezin ji zeviyên zeytûnan di destî komîteya çandiniyê de ne û xwedî lê derdikeve. Di vê demsalê de careke din di komkirina van berheman de gelê Efrînê xwe tê de dinîne û him jî dibe jêdara debara jiyana wan. Têkildarî rakirina berhemên zeytûnan yên îsal de berpirsê Komîteya daran li kantona Efrîn û Şehbayê Mihemed Ebdo her wiha jina kedkar yê bi navê Fatmê Bekir ji rojnameya me re axivên.

**Xeteriya li ser gel di rakirina berhemên zeytûnan de**

Mihemed diyar kirk u ji ber rewşa herêmê wan zû dest bi komkirina mewsimê kir û wiha got: "Herêm di van demên dawiyê de rastî gelek topbaranên dagirkeriya Tirkiyê tê, bi taybet bi geşedanên dawiyê re her roj di dem û cihên cuda de herêmê bi giştî digire hedef. Navşeya Şêrawa yek ji xetertirîn herêmên me ye û weke xeta sînor di navber me û komên çeteyan de tê pênasekirin. Beşeke mezin ji darên zeytûnan yên di destê me de li wirin her wiha yên hemwelatiyên wan gundewaran jî li wir hene, bi topbaranên dagirkeriya Tirkiyê re em mecbûr man ku berhemên wan deveran hinekî zûtir rabikin, da ku gel û kedkar rastî êrîên dagirkeriyê neyên. Lê her çiqas em xwe biparêzin, dijmin di her kêliyê de hemû herêmê hedefdigire û gelek caran kedkar û malbatên ku ji bo komkirina zeytûnên bi zanebûn xistine hedef".



Mihemed Ebdo



Fatme Bekir

**Avakirina atoliyên çinîna zeytûnan**

Mihemed di berdewamkirina axaftina xwe de ev anî ziman: "Weke ku tê zanîn niha dema çinîna zeytûna ye û me jî dest bi rakirinê kir, hejmara darên ku di destê me de nêzî 9500 darên zeytûnê ne. Ev xebat bi riya atoliyan hatiye destpêkirin 3 atolî me avakirin û nêzî 75 kedkar tê de kar dikin û sûd digrin. Gelê Efrînê bi hezkirina xwe ji zeytûnan re tê naskirin, me jî xwest bi van xebatan em him di aliyê madî de bibin alîkar him jî di aliyê manewî de. Bi rastî jî ev yek tê xuyakirin çawa ku bi hezkirin û kêfxweşî derbasî nava zeviyan dibin û bi hêviya vegera Efrînê û çinîna zeytûnên xwe nêz dibin. Armanca me ye sereke ku em bi gel re bibin alîkar ji lewra ji nû de nêzî 1000 darên zeytûnê me xistiye xizmeta gelên li herêmê".

**Dorpêç bandora xwe li ser berhemdana daran dike**

Mihemed bal kişand ser xwezaya xwedîkirina zeytûnan û bandora dorpêçê û wiha pê de çû: "Efrînî di xizmetkirin û çawaniya derketina kalîteya zeytê ya herî baş de; pir baş nasdikin û li ser wê esasê xwedîkirina daran jî wiha dikirin, xwezaya darên zeytûnê salekê berhem dide û salekê jî nade, di ew sala ku berhem nade de divê lê baş were nêrandin, û dema ajotina axa wê divê di dema wê de bê kirin her wiha cûreyên semad yê gûncav jê re bê dayîn û qusandina wê jî di dema wê de bê kirin. Bê guman rewşa herêma Şehbayê gelek cuda ye di aliyekî de em êşa dorpêça Hikuemta Şamê dikşînin, ev yek ji topbaranên dagirkeriya Tirkiyê be qute. Ji lewra di aliyê peydakirina sotemenî û bêdiviyên daran de em astengiyan dikşînin. Ev yek jî yekser bandora xwe li ser berhemdana daran jî dike".

**Bi hêviyên mezin… çinîna zeytûnan**

Her wiha dayîka Fatme wiha behsa hatina xwe ji komkirina zeytûnan re kir: "Zeytûn û xwedîkirina wan li gel min weke xwedîkirina zarokan e, ev yek ne tenê li gel min wisa ye li gel hemû dayîkên Efrînê yên ku niha bi hesreta girtina şaxên darên xwe ne. Ev karê ku em dikin bi hezkirin û xwestek tê kirin ji ber him em jê hezdikin û hem jî dibe alîkar bi me re. Hevjîna min nexweşe û ew nikare gelek karan bike, ji ber vê jî ev derfeteke ku ez bixebitim û debara jiyanê pê bikim. Em rojê 7 saetan dixebitin û her saetek bi 8 hezaran tê hesibandin, bê guman rojane em dikarin bi malbata xwe re bibin destek û alîkar. Ez her roj bi hêviya vegera nêz ya ser xaka xwe û çinîna zeytûnên Efrînê têm kar, baweriya me mezine wê rojek bê û emê wan çeteyan ji nava zeviyên xwe yên pîroz biqewitînin".



# 'Bi hezaran pênûs dê heqîqetê eşkere bikin'

Rojnamevan Gulîstan Gumuş diyar kir ku dewleta Tirk a dagirker ji bo ku dengê heqîqetê biçewisîne û polîtîkayên qirêj ên li ser civakê pêk bîne, rojnamevanan dike hedef, bi işkence û qetilkirinê dixwaze wan bê vîn bihêle.

**Tekoşîn Amara/Qamişlo**

Êrişên dewleta Tirk a dagirker ya li dijî dengê azadî û rastiyê bê navber dewam dike. Hıkumeta AKP-MHP'ê ya faşîst ji bo rastiyê bide veşarttin , di serî de rojnemevanêndengê rastiyê dike hedef.

Di derbarê erîşên dewleta Tirk yên li ser çapemeniya azad, nûçegihana JINNEWS Gulîstan Gumuş ji ronameya me re axivî.

**'Bi hedefgirtina rojnamevanan dixwaze rastiyê veşêre'**

Gulîstan diyar kir ku dewleta Tirk bi kiryarên girtin, qetilkirin û îşkenceyê dixwaze rastiyê veşêre û wiha got: "Heta niha 38 rojnamevan hatine girtinm, 9 rojnamevan jî hatine binçavkirin û bi gelek kiryarên qirêj re rû bir û hatin hîştin. Rol û misyona rojnamevanan pir girînge ku rastiya dewleta Tirk bi awayekî eşkere derxîne holê, tenê wêneyekî ji bo eşkerekirina sûcên pergalên zordest bes e, li çar parçeyên KurdIstanê, taybet şerê ku li Bakur, Başûr û li Rojava tê meşandin vê rastiyê bi awayekî eşkere raxist ber çavê cîhanê, ji ber vê jî desthilatdariya Tirk hewil dide rojnamevanan bêdeng bike da ku rastiyê veşêre. Çapemeniya azad jî bi israre ku diroka dewleta Tirk a qirêj bi pênûsa xwe derxîne heqîqetê."

**'Dewleta Tirk çapemeniya azad ji bo xwe wek xeterî dibîne'**

Gulîstan diyar kir ku dewleta Tirk çapemeniya azad wekî xeteriyekê li ser siyaseta xwe ya qirêj dibîne, ji ber vî yekê rojnamevanan digre, qetil dike, îşkence dike û wiha domand: "Bi Taybet girtina rojnamevanên jin di çarçoveya siyasêtên wê yên domdar ên li dijî mafê jinan, tên kirin. Çapemeniya azad xwe bi rêxistin kiriye, heta niha bi salan e dewleta Tirk polîtikayên zilim û zordariyê li ser çapemeniya azad dide meşandin. Sedema wê pir zelal li holê ye, nasnameya kurdan bi salan e bi polîtîkayên înkarê hatiye tunekirin û dewleta tirk dixwaze ku nasnameya gelê kurd were jibîrkirin, kurd nasnameya xwe nas neke û bê pişaftin."

**'Çapemeniya azad zordariya li ser gelê kurd ji cîhanê re eşkere kir'**

Gulîstan wiha domand: "Di vê pêvajoya ku li Bakurê KurdIstanê dewleta Tirk qeyûm avetên li ser şaredariyên, Mêrdîn, Êlih û Xelfetiyê dema ku gelê kurd rabû ser piyan û daxwaza maf û îrada xwe kir, hat qetilkirin, sergunkirin, cezakirin û girtin, bi gelek bê hiquqiyê re rû bi rû man. Ji ber ku çapemeniya azad xwast bibe dengê gelê kurd, bû hedefa dewleta Tirk û rojnemevan bi îşkenceyan hatin girtin. Rojnamevanên li pey rastiyan in bi êrişên sîstematîk ve tên astengkirin, di heman demê de li Amedê û Êlihê hevalên me yên rojnamevan bi zext û êrişan re rû bi rû man. Herî dawî di protestoya dijî qeyûmê Êlihê de nûçegihana JINNEWS'ê Pelşîn Çetînkaya bi lêdanê û bi kaşkirina erdê re hat binçavkirin. Û hevala me ya rojnamevan Mizgîn Sonuk li Êlihê hat girtin. Lê ev zext nikarin me bêzar bikin û kedkarên çapemeniya azad tevî hemû zextan jî wê rastiyan ji gel re ragihînin.

Ji ber hişmendî û zordariya dewleta Tirk gelek kesan dest bi nûçegihantiyê kir û hemû zilim û zordariya dewleta tirk îfşa kir. Dewleta Tirk ji ber ku îfşa bû û hemû polîtîkayên wan yên qirêj derket holê, bi vî re hemû cîhan rastiya dewleta tirk dît, ji ber vî jî xwest li ser çapemeniya azad zilim û zordariyê bide meşandin ku çapemenî dev ji rastiyê berde. Tevî hemû eriş û qetlîam û girtinan jî, bi salane çapemeniya azad wek mîrasekê li ser şopa heqîqetê karê xwe dimeşîne."

**'Rojnamevanên jin bi kiryarên bêhiqûqî re rû bi rû dimînin'**

Gulîstan da zanîn ku di vê pêvajoyê de yên ku herê zêde zehmetiyan û bi tûndiyê re rû bir û man jin bûn û wiha li axaftina xwe zêde kir: "Ji ber ku jin di nav malbatê de bi hişmendiya mêr mezin bû û derbasî xebatên çapemeniyê bû, di vir de jî bi hişmendiya Dewletê re rû bi rû ma, rûxmê hemû bêhiqûqiyan jî li ber xwe da, gelek caran hevalên jin yên ku têne binçavkirin bi awayek bêexlaqî hatine lêgerînkirin."



**'Çavê gelê kurd li çapeniya azad e'**

Nûçegihana JINNEWS Gulîstan Gumuş di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Pêwîste her rojnamevanekî vî karî ji bo xwe wekî spartekê kî bibîne, em wek rojnamevan di çavê gelê kurd de hêvîne, ji ber ku gelê kurd heviyek di çapeniya azad de dibîne. Ji ber vê jî pîwîste rojnamevan rê nîşana civakê bide û bibe çav û pênûsa rastiyê, herwiha pêwîste her rojnamevanek li hember erîş, girtin û îşkenceyên dewleta Tirk li ber xwe bide û di tekoşîna xwe de bi israr be."

# 'PKK'ê wijdana Mirovhiyê parastiye'

**Diyala Nîdal/ Qamişlo**

**Rêveber û endamên Meclisa Malbatên Şehîdan a bajarê Qamişlo diyar kirin ku damezirandina PKK'ê ji bo tevahiya gelê kurd bû vejîn û wiha gotin: "Bi avabûna Tevgera Azadiya Kurdistanê re jina kurd bû xwedî nasname û civaka kurd hat birêxistinkirin."**

Girêdayî salvegera 46'emîn a damezirandina Partiya Karkerên Kurdisatnê (PKK), endamên Meclisa Malbatên Şehîdan Cîhan Gulo û Xêriya Hesen ji rojnameya me re axivîn.

**'PKK'ê ji bo gelê kurd serdemeke nû bû'**

Cîhan Gulo anî ziman ku damezrandina Partiya Karkerê Kurdistanê ji bo gelê kurd serdemeke nû bû û wiha got: "Gelê kurd û bi taybet dayîkên şehîdan, ji destpêka ku PKK'ê dest bi têkoşînê kir, me dest xwe daye vê tevgerê. Herwiha ji bo vê tevgerê em kar û xebatên xwe bê navber berdawam dikin. Di salên 84'an de, Partiya karkerên Kurdistanê PKK 'ê berê xwe da Rojavayê Kurdistanê, di wê demê de ji wan re digotin daxwaz. Dema ku Partiya PKK' ê daket Rojavayê Kurdistanê ji gelê Rojava hebûn bû. Ji ber ku gelê kurd LI Rojava hatibû pişaftin, PKK'ê ji bo gelê kurd bû her tişt. Vê tevgerê hebûna gelê kurd û bi taybet hebûna jinê misoger kir. Ji ber ku di wê demê de jin bindestbû. Partiya PKK'ê hêzek ji bo jinê avakir, îro bi saya wê jinê di tevahiya qadan de cihê xwe girt û bû pêşeng. Dema em behsa PKK`ê dikin, em dikarin bêjin ku ew partiya zanîn û şehîdan e, ya ku wijdana mirovayiyê parastiye. Şansê gelê Kurd heye ku PKK'ê derket. PKK'ê xwedî fikir û zanistê ye. Damezrînerên wê, têkoşerên rastî û xwedî fikr û bawerî ne ji bo ku gelê kurd mafê xwe bi dest bixe."



Cîhan Gulo



Xêriya Hesen

**'PKK 'ê qonaxeke nû ji gelê kurd re afirand'**

Cîhan Gulo da zanîn ku PKK'ê bi xwe ne ji wan partiyên ku bi fikr û rêxistina xwe bi terzê kilasîk û kevnar yên mîna partî û tevgerên kurdan e û wiha got: "Em nikarin hevrûkirinekê di navbera Partiya Karkerên Kurdistanê û partiyên din de çêbikin, ji ber ku PKK'ê li ser fikr û rêbazîkî nû hat afrandin. Di heman demê de tiştê ku PKK'ê ji bo gelê kurd kir, van partiyên berê yên kurdan nikarîbûn pêk bînînin, lewma gelek ji van patiyan jî li dijî vê fikr û felsefeya nû kar dikin. Bi derketina PKK'ê re sûdeke mezin li gelê kurd hat kirin ku destpêka qonaxeke nû ji bo gelê kurd hat afandin û vê partiyê dîroka kurdan, ziman, nasname û çanda kurdî bi cîhanê jî da naskirin. Ev qonaxa nû ya li ser fikr û felsefeya Netewa Demokratîk nefes da civakê, di serî de jin ji hişmendiya malbat, dewlet û kevneperstiyê a serdest hat rizgarkirin. Bi vî awayî jina kurd li nik zilamê kurd xwe bi rêxistin kir û sîtstema hevseroktiyê hat çêkirin. Gelê şoreşgerî li her çar parçeyên Kurdistanê bi pêşengtiya jinê biryara destpêkirina têkoşeriyeke bê hempa di vê qonaxa nû de da. Jina kurd li Kurdistanê dest bi berxwedaniyekê kir ku xwe di hemû waran de, weke milê siyasî, aborî, civakî û hwd… li pêş xist di aliyê leşkerî de bû. Berxwedaniya jinan ya ku di şerê li dijî DAIŞ'ê de yê li Rojava û Şengalê da meşandin, berxwedaniyeke bêhempa bû."

**Destpêka damezrandina PKK'ê**

Endama Meclisa MalbatêN Şehîdan Xêriya Hesen jî balkişand li ser damezrandina Partiya Karkerên Kurdistanê PKK'ê û wiha got: "Ji destpêka ku şehîd Heqî Qerar şehîd ket,Partiya Karkerê Kurdistan ava bû û di sala 1978' an de bi 22 kesen ev partî hate damezrandin. Di wê demê de Rêber Apo got em ê partiyekê avakin ji ku em tola şehîdên xwe rakin. Ragihandina partiya di 27'ê Mijdara 1978'an de bû. Ji wê demê heta roja îro ew fikir û felsefeya Rêber Apo belav bû û hîn jî berdewame li ser vî bingehî li berxwe dide. PKK'ê li hemberî êrîşên dewleta Tirk a dagirker li ber xwe dide, gelek têkoşîn û berxwedanî kiriye û hîn jî dike."

**'PKK' ê ji bo jina kurd bû nasnameya jina azad'**

Xêriya Hesen axaftina xwe wiha qedanid: "Rêber Apo gelek deskeftî da jinê, ku îro jinê di gelek qadan de cihê xwe girtiye. Herwiha Partiya Karkerên Kurdistanê ji bo jinên kurd bû nasnameya jina azad, bi saya Rêber Apo û PKK'ê jin di nava civakê de guhertineke mezin çêkir. Jin di aliyê leşkerî de pir li ber xwe dida ku jinê di çepelê çiyan de jinê şerekî mezin li hemberî dagirkeriya Tirk kiriye, bi avabûna Partiya Karkerê Kurdistan PKK'ê ji bo jinê bû riya azadiyê ku roja îro jin bûye xwedî hêzeke mezin. Di hemanê de Partiya PKK'ê ji bo jina kurd bû riya azadiyê û pêşketinê, heta roja îro jin bi taybet şervanên YPJ'ê berxwedaniyê û têkoşînê dike."

# Fêmkirin û şîrovekirina pêvajoyê bi xwendina Rêber Apo pêkan e

Akademiya Zanista Civakî ya Rêber Apo li tavahî Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi armanca xwendin, têgihêştin û piratîkkirina fikrê Rêber Abdullah Ocalan ên ku wî di pirtûk û pareznameyên xwe de anîne ziman; dibe şêwaza bingehîn ji qada perwerdê û gelên herêmê re. Endama Akedemiyê Gulistan Mistefa da zanîn ku felsefeya Rêber Apo felsefeyeke gerdûnî ye û divê bibe terzê jiyana gelên herêmê.

**Zana Roj/ Şehba**

Serdema nû ya ku bi pêşketina moderntiyê, geşedan, guhartin û veguhartinên gerdûnî re tê bi rêvebirin. Şoreşa mirovahiyê ya sedsala 21 emîn bi pêşengtiya ramanên fîlosofê demê Rêber Abdullah Ocalan tê ronîkirin. Ev raman di encama lêgerîn, pirsyar û kedeke mezin hatin derketin. Li ser bingeha avakirina civakeke aqlaqî, polîtîk, ekolojî û azadîxwaziya jinê bi tezê Konfedralîzma Demokratîk şekil girt û dibe malê civakê. Ev felsefe muhra xwe li hemû cîhanê xistiye, bê guman şekilgirtina wê ya yekemîn di Şoreşa Rojavayê kurdistanê de hate pêşketin. Ev felsefe hemû gelên herêmê anîn gel hev û weke dijberê moderniteya kapîtalîst derket holê û bi ser ket. Rêber Abdullah Ocalan bi ked û bedelên ku dayî, hêşt ev raman bi riya pirtûk û pareznameyên xwe bibin malê civakê. Ramanên Rêbertî ji hêzên desthilatdar û gilobal re dibe metirsî, tunebûna xwe jî di nava pergala moderniteya demokratîk de dibînin. Lê Rêber APO sînorên Îmraliyê û yên cîhanê bi hêza xwe derbas kirin û pirtûkên xwe li tavahî cîhanê belavkirin.



Li ser van bingehan di pêvajoya heyî de Tevgera Azadiyê bi giranî hêza xwe dide xwendin, naskirin û anlîzkirina pirtûkên Rêber APO, Akedemiya Zanistî ya Rêber APO jî weke aliyekî fermî ku navenda wê li Bajarê Hesekê ye hate vekirin û şaxên xwe li hemû herêman berda. Berdefka Akedemiyê ya Kantona Efrîn û Şehbayê Gulistan Mistefa zêdetir di vê mijarê de ji rojnameya me re axivî.

### Akedemiya Zanisa Civakî di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de

Gulistanê di destpêkê de behsa xwendina Pirtûkên Rêber APO kir û wiha got: "Ev Akedemî girîngî dide xwendina pirtûkên Rêber APO ne tenê parezaname lê hemû pirtûkên ku hatine nivîsandin, di aliyê femkirin û têgihîştin de gelek girîngî didiyê. Zêdetirî salekê ye di hemû herêmên Bekur û Rojhilatê Sûriyê de ev yek hatiye aktîfkirin û bi disiplîn ev xebat tê pêşxistin. Ev xebat bi şêwazê avakirina giropan tê birêxistin kirin, niha li herêma Şehbayê jî 7 girop hatine avakirin, weke gavên destpêkê bi vê şêwazî tê birêvebirin û hemû girop di dem û cihên cuda de li hev kom dibin û pirtûka Rêber APO dixwînin û nîqaşên berfireh têne pêşxistin. Di vî alî de hemû sazî, tevger, partî û xebatkarên herêmê cihê xwe di nava giropan de digirin û çalakiyên giştî yên xwendinê pêş dixînin".

### `Şîrovekirin û Analîzkirina Pêvajoyê bi xwendina Rêbertî dibe`

Gulistanê diyar kir ku bi riya xwendina pirtûkên Rêbertî ewê bikarin xebatê ku tê meşandin bi ser bixînin û wiha domand: "Di sîstema ku Rêber APO ji me re daya avakirin û pêşkêşkirin de, çawaniya xwe gihandina cewherê mirovahiyê û serxistina şoreşê bi xalên stûr û zirav daye ravekirin. Yê ku li ser gelê Kurd jî çawaniya xwekurkirina di vê felsefê de û çawa ewê bikaribin vê felsefê di hemû kar û jiyana xwe de biteysînin û bidin jiyankirin e. Ji lewra di vê pêvbajoyê bi taybet de û bi gihandina Şoreşa Rojavayê Kurdistanê ji vê astê re, bê guman barê li ser me daha zêde girantir dibe. hemû alî û dijminê gelê Kurd li ser felsefeya ku di herêmên Rêveberiya Xweser de hatiye biserxistin; dixebitin û kêlî kêlî hilweşîna vê felsefê hêvî dikin.

Di dem û zemaneke bi vî rengî de divê gel ji siyasetên dewletên navnetewî û dijmin bi ziravî serwext be. Bê guman ev yek tenê wê bi avakirina sîstema Rêveberiya Xweser de nemîne, divê gelê me û hemû pêkhateyên herêmê di aliyê îdeolojiya Rêber APO de têgihîştî bin da ku rê li ber siyasetên şerê taybet venebe. Ev yek jî tenê bi xwendin û xwekurkirina di ramanên Rêber APO de pêkan e, dema ku em pêvajoyê bi şîrovekirin û analîzkirina Rêber APO bizanibin wê bê guman ev gel wê bibe mertala ku nayê derbaskirin li hember dijmin û hemû hêzên navnetewî. Em her çiqasî xwe di fersefeya Rêbertî de kur bikin ewê yekser li ser pêşxistina xebatê me jî bandor bike, li ser van hîman emê tenê bi riya xwendin û fêmkirina Rêbertî bikaribin xebatên xwe yên navxweyî jî biserbixînin".

### Xwendina Rêbertî hêza avakirina civaka ku nayê têkbirin e

Her wiha Gulistanê anî ziman ku dijmin fikirên Rêber APO di şexsê gelê Kurd de hedef digire û wiha pê de çû: "Di vê serdemê de metirsiya hemû hêz û civakên navnetwî ji berfirehbûna ramanên Rêber APO ye, di serî de dijminê gelê Kurd tunebûna xwe di vê îdeolojiyê de dibîne, ji ber dema ku ev îdeolojî pêşdikeve rastiya dijmin tê xuyakirin û hemû maskeyên li ser rûyê wan tên e rakirin. Ji ber vê yekê her ku ev îdeolojî tê berfirehkirin êrîşên dijmin li ser gelê me zêdetir dibin, dijminê gelê Kurd fikirên Rêbertî di şexsê gelê Kurd de digire hedef. Li ser van bingehan di nava xebatê xwendina îdeolojiya Rêbertî de hemû kes dikare cihê xwe bigire, di xwendina pirtûkan de ciwanên me, kesên rewşenbîr û xwendevanên me cihê xwe digirin. Bê guman ev yek wê bibe hêza avakirina civakeke ku nayê têkbirin ne niha û ne paşê".

# Armanca êrişên li ser Rojava

**Navenda Nûçeyan**

Dewleta Tirk ya dagirker û rêveberîya wê ya faşist her ku di şerê li dijî gerîlayên Moderniteya Demokratîk de derbeyên mirinê dixwe, berê xwe dide Rojava û gelên li Rojava dijîn bi zarok û kal-pîr û hemû pêkhatîyan dide ber bombeyan, sûcên şer dike. Bêguman ji ber ku dewletên cîhanê tev wekî hev in û di tova hevîrê wan de komplo, derew û dizî heye û bi destê mêrê bêbext hatîye strandin, qirkirinên ku dewleta Tirk ya dagirker li tevahî Kurdistan'ê û bi taybetî jî yên ku li Rojava pêk tîne naxwazin bibînin. Ji lewra jî ji gelên xwe jî vedişêrin.

Belê, par gava di 1'ê Cotmehê de lehengên Kurd Rojhat û Erdal'an çalakîya canbexşane li Enqerê kirin, dewleta dagirker êrîşî Rojava kir. Îsal jî piştî çalakîya lehengî ya Rojger û Asya'yan di 23' cotmeha îsal de li dijî Tusaş'ê hate kirin, dewleta Tirk ya dagirker ji berê hovanetir êrîşî Rojava kir. Qaşo bi wan êrîşên hovane wê me wekî gelên herêmê bitirsîne. Me bi dayîna bi dehhezaran şehîd ew tirs şikand û îro em bi gîyana şehîdên xwe re dijîn.

Bê guman hin armancên dewleta Tirk ya dagirker hene. Armanca stratejîk tunekirina Tevgera Azadîyê ye. Şefê faşist baş dizane ku, bi tunekirina Tevgera Azadîyê re wê bi temamî Kurd ji ser rûyê erdê rabin. Ji boyî bigihîne vê armancê jî divê destkeftîyên Kurdan yên di xeta azadîyê de hatine bidestxistin ji holê werin rakirin. Ji boyî vê jî divê Kurdên Rojava û pêkhateyên wê li dijî Tevgera Azadîyê rabin ser pîyan. Bi van êrîşên xwe yên hovane ji me Kurdên Rojava û pêkhateyên wê re dixwaze bêje ku; "ji ber ku hûn piştgirîyê didin PKK'ê, em êrîşî we dikin. Gava hûn li dijî PKK'ê derketin, em ê êrîşên xwe bidin seknandin û em çawa têkilîyan bi Mala BERZANÎ re pêş dixin, em ê bi we re jî pêş bixin". Ev, lîstikeke şerê Taybet ya dewleta Dagirker e û divê em wek Kurdên Rojava û pêkhateyên wê di vê mijarê de pir baldar bin. DYA, Tirkîyê, mala BERZANÎ û ENKS bi hev re dixwazin xeta azadîyê li Rojava tune bikin. Heger îro em bi vîna xwe herêma xwe bi rêve dibin û gihane statuyekê, ev, bi xêra têkoşîna Tevgera Azadîyê çêbûye û xwîna şehîdan hatîye bidestxistin. Divê em wekî gelê Rojava ji bîr nekin ku ji çar parçeyên Kurdistan'ê keç û xort hatin û xwîna xwe rijandin li Rojava. Ne tenê zarokên Kurdan, ji çar alîyên cîhanê enternasyonalîstên ku bi xeta Rêber APO bawer kirine xwîna xwe rijandin. Şehîdan, bi xeta Rêber APO bawer kirin û canê xwe dan. Heger em werin lîstika Tirkan, ew tê wê wateyê ku, em îxanetê li şehîdên xwe dikin. Divê şefê faşist bizanibe ku, nîyeteke me ku em îxanetê li şehîdên xwe bikin tune ye!  Em wekî gelên herêmê di wê zanebûnê de ne. Dewleta Tirk jî wê yekê dizane. Lê dibeje; "dibe ku hinek kesên lewaz derkevin, yên ku agahîya wan ji rastîyên dîrok û sîyaseta min tuneye, an jî kesên ku tenê bi jîyana xwe û malbata xwe difikirin bi me bawer bikin û li gorî me tevbigerin". Lîstika dewletê tev li ser kesên wiha ye. Ji xwe sîxorên



ku îro dibin sedema şehîdkirina hevalan ji wan kesên ketîne, rihê wan mirîye. Divê em tev ji boyî ax û statuya herêma xwe û xeta Rêber APO xwe bigihînin kesayeta şehîd Rojger HÊLÎN û Asya ELÎ ku xwe di mêjîyê Enqerê de teqandin.

Em wekî gelên herêmê vê jî dizanin; heger îro dewleta Tirk ya dagirker hin têkilîyan bi mala BERZANÎ re pêş dixe, ev, ji ber ku pêdivîya dewleta Tirk ya dagirker bi wan xayînan heye û gava karê wan qedîya, çawa dewleta Tirk ya dagirker xayînên berê avêtin ser sergo, wê Mala BERZANÎ jî bavêjin ser sergo.

Belê, bi tenê divê em rê nedin ku, dewleta dagirker destê xwe biavêjie nava me û bi lîstikên xwe yên qirêj me perçe bike. Dibe ku em îro hinekî birçî, tih bimîn in. Dibe ku em bê kehrebe, bê mazot bimîn in, di zivistanê de zehmetîyên sermaya bikişîn in. Lê tu tişek wekî silavên ku me ji Rêberê xwe Rêber APO girtî me, hebûna me û siberoja me germ nake. Silava ku ji Rêber APO hatî di encama berxwedana gelan de hatî. Ji boyî Rêbertî bi xwe jî were nava me, divê em asta berxwedana xwe bilind bikin û pêngava "JI RÊBER APO RE AZADÎ, JI PIRSGIRÊKA KURD RE ÇARESRÎ" bigihîn in serkeftinê. Wekî din tu misogerîyek ji statuya Rojava re tune ye. Ewlehî û misogerîya serkeftina şoreşa me ya Rojava em wekî gelên herêmê û mirovahîya ku bi xeta Rêber APO bawer dike ye, ne tu hêzeke din e.



# 'Pêwîste Netewên Yekbûyî alîkariya Rêveberiya Xweser bike'

Şêxmûs Ehmed destnîşan kir ku li beramberî tevahî şert û mercên dijwar Rêveberiya Xweser bi erka xwe ya mirovî radibe û wiha got: "Pêwîste hemû rêxistinên navnetewî bi erkê xwe rabin û piştgirî bidin Rêveberiya Xweser, ji ber ku ev erkekî mirovî ye."

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Di çarçoveya siyaseta dorpêça hikumeta Şamê û dewleta Tirk a dagirker li ser herema Bakur û Rojhilatê Sûriyê, rêbaz û pilan li ser gelê heremê tên meşandin. Yek ji wan siyasetan jî qutkirina alîkariya mirovî ye, bi taybet li ser gelê ku li kampan de dijîn. Wek tê zanîn ku di herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê de 17 kampin, ji wan 17 kampan tenê 5 kamp ji aliyê Netewên Yekbuyî ve bi fermî tê naskirin. Her wiha 12 kampên din jî tenê Rêveberiya Xweser û hin saziyên xwecihê alîkarî û destekê pêşkêş dikin.

Derbarê hazirtî û amedekariyên demsala zivistenê ji kampên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê Hevserokê Ofîsa Karên Penaberan a Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Şêxmûs Ehmed ji Rojnameya me re axivî.

### Hijmara kampeyên li Bakur û Rojhilatê Suriyê

Şêxmûs Ehmed di destpêka axaftina xwe de wiha got: "Rêveberiya Xweser 17 Kampên penaberan bi fermî ji hêla xwe ve bi rêve dibin. Ev kamp jî li tevahî kantonan hene, li kantona Cizîrê 6 kamep, li Dêrezorê kampeke, li Reqa Kampek, li Tepqayê 2 kamp, li Minbicê 2 kamp û li Şehba û Efrînê 5 kamp hene. Bi rastî rewşa kampan di hemû aliyan de Rêveberiya Xweser û saziyên ku di nava kampan de kar dikin pir astengî û zehmetî dikşînin, ji ber ku di nav kampan de hijmarek pir mezin ji penaberan heye û ji nav 17 kampan tenê 5 kamp ji hêla Netewê Yekbuyî ve têne naskirin û destek dayin, her wiha 12 kampên din jî bê alîkarî û destekdayina dewletên navnetewî mane. Ji ber vê yekê Rêveberiya Xweser û hin saziyîn xwecihî destek didin van kampan, lewma pir astengî û zehmetî tê kişandin."

### Astengî û zehmetî

Şêxmûs balkişand ser rewşa kampan bi hatina zivistanê re û wiha got:"Bi hatina demsala zivistanê re, em gelek guhetinan di hundirê kampan de didin kirin, wekî ku çadirên hatine qetandin û ne saxilem be, em destpêkê wan diguherin, ji ber ku dema baran were malbatên di kampan de jiyan dikin di nava avê de nemînin û çadirên wan saxlem be. Her wiha ji bo mijara tendirostiyê wekî rêxistna tendirostî ya cîhanê, di destpêka sala 2024`an xwe di nava kampan de bi cih kirin, di heman demê de mijarên perwerdê û xizmetguzarî pir zehmetî û astengî tê dîtin, wek tê zanîn ku herêma me di nava dorpêçekê de ye û ev dorpêç zehmetiyên pir mezin bi xwere tine û dibe asteng li pêşiya alîkariya penaberan. Heta Hikumeta Şamê jî rê nade ku alîkariya mirovî derbasî herêma Bakur û Rojhilatê Suriyê bibe, di heman wextî de girtina dergihê Til Koçer zehmetiya herî mizine ku nahêlin alîkarî derbasbibe. Ji ber vê yekê hewildanên Rêveberiya Xweser û saziyên xwecihî hene ku vê valatî û kêmaniyên heyê dagire, ji ber ku penaberên di kampan de dijîn gelek êş û azar dikşînin."

### Di demsala zivistanê de, rewşa kampan

Ehmed wiha berdewamî da axaftina xwe û got: "Em niha dikevin demsala zivistanê de û li gelek bajaran jî bara bariya, di her demsala zivistanê de, em konên qetiyayî yên ku zerar li wan hatiye kirin diguherin, di heman demê de malbatên ku sope ne gihîştiya wan em her sal li wan belav dikin û niha jî em hazirtiyê belvkirina sopan, cilên zarokan, sungeran, betaniyan û mazotê dikin, di destpêka miha 12`an de wê alîkarî destpêbike. Rêveberiya Xweser her ku bernameya xwe ya alîkariyê û destekdayina penaberên ku di kampan de dijîn hazir dike, lê mixabin êrişên dewleta Tirk a dagirker li ser herêmê nayê rawstandin û bi taybetî cihên xizmetguzarî dike armanc, ev jî bandorekî neyinî li ser penaberan dike. Wek tê zanîn ku elektirîk, mazot û av li ser penaberan tê qutkirin, ji ber ku cihên ku tên armanc girtin hemû cihên xizmetguzarî ne wekî nexweşxana, stasiyonê petrol, stasiyonên avê û stasiyonên elektirîkê. Ev hemî gel du wan jiyana xwe dimeşand, lê birovajî vê, gelê herêmê daketin qadan, hêrs û nerazîbûna xwe li dijî êrişên dagirkeriyê derxistin, kîn û nifreta wan zêdetir bû; ev ji bo dijmin bersifa herî xurtbû û da isbat kirin ku îrade ji her tiştî girîngtire. Ji ber vê yekê dewleta Tirk a faşîst dixwaze plan û sîstema Rêveberiya Xweser helweşîne û destkeftiyên heyî ji holê rake."

### 'Pêwîste Netewên Yekbuyî alîkarî ji bo tevahî penaberan pêşkêş bike'

Hevserokê Ofîsa Karên Penaberan a Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê



Sûriyeyê Şêxmûs Ehmed di dawiya axaftina xwe de da zanîn ku alîkariya saziyên Navnetewî ji bo penaberan pir kên û lawaze û wiha doman: "Di kongireyên ku li Biroksilê çêdibin ji bo alîkarî û destekdayina penaberan, her wiha li gorî herêmên din, herêma Bakur û Rojhilatê Suriyê pir kên alîkarî pêşkêş dikin, pir kêm û lawaz destek dayin tê kirin, li vir tê dîtin ku edalet tune ye. Ji bo çareseriyê û destekdayinekî bi wate pêwîste hemû kampên ku li herêma Bakur û Rojhilatê Suriyê xwe bi cih dikin ji aliyê Netewên Yekbuyî ve werin nasîn û bi fermî alîkariyê pêşkêş bikin. Di heman demê de pêwîste dergihê Til Koçer were vekirin, da ku alîkariya mirovî ji bo penaberan derbasî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bibe û zehmetî newe kişandin."

# Şer û xiyanet

**Volqan Elî**

Sal 1938! Cîhan ber bi dojehekê ve digindire. Şerê Cîhanê yê Duyemîn! Ev tufanek e, lê naşibe tufana Nûh Pêxember. Ji ber ku yê vê carê biryara tufanê dane însan in (!), axayên şer in. Wê di encama şer de bi deh milyonan mirov bimirana, cîhan ji nû ve li hev parve bikirana!

Di heman pêvajoyê de welatê agir û rojê Kurdistan, çawa ku bi sedan sal bû di agirê qirêj ê dijminan de şewitîbû, herî dawî tevî berxwdana Seyid Riza jî nekarîbû ji agirê qirêj ê îblîsan xwe xelas bike. Sed mixabin ku ev ne ji ber quwet û zîrekiya dijmin bû!

Çawa ku kurm li darekê bikeve, êdî xelasiya darê zehmet e; baskê Pîr Seyîd Riza jî bi xiyaneta Rayber û Zeynel, di şerê di jî leşkerên Mistoyê Kor (leşkerên Komara Tirk) de şikestibû. Rayber xismê herî nêzîkî Wî bû. Gava ku Rayber rûyê xwe yê tev bi jehr nîşanî Elî Şêr ê mifteya welatê Dêrsimê û Zerîfe dabû, ew bi vê rewşê xapiyabûn. Naxwe du şêrên çiyan, di şeran de ti car têk neçûbûn. Têkçûna Elî Şerê fermandar, rêber û hozanê welat, bibû sedema têkçûna Dêrsima welatê çiyan. Bi têkçûna Dêrsimê ne tenê bi hezaran Kurdên bê guneh, zarok, jin û êxtiyar di şikeftan de bi dermanên mişkan hatin xeniqandin, Kurdistan kete qonaxeke nedîtî tarî û bêdengiyê. Çiya bi çiya, mezra bi mezra, gund bi gund, bajar bi bajar hemû Kurdistan ji nû ve hate dagirkirin. Heta bi şaneya herî biçûk a mejiyê însanê Kurd hate dagirkirin. Kurd ketin gereke bê binî ya tirs, ji xwe revîn û xiyanetê.

Vaye di van mercan de jî herî kêm li parçeyê welêt ê Bakur, Kurdan pêşwaziya Şerê Cîhanê yê Duyemîn dikir. Dêrsim! Hêviya herî dawî ya Kurdan! Bi alîkariya Rayberan êdî di devê 'gurên boz' de bû. Ji wê jî xirabtir, bi Rayberan, xiyaneta heyî kokê xwe kûrtir ajotibû.

Di sedsala 21. de jî û bi taybetî di van rojan de Şerê Cîhanê yê Sêyemîn bi hemû xwînxwarî û dirindebûna xwe didome. Ji ber çi, şerekî xwînxwar e? Ji ber ku ev şer, ne şerê gel û bindestan e. Şer, şerê parvekirinê ye; çawa ku di yê yekemîn û yê duyemîn de bûye... Şerê gel ê şoreşgerî û şerê bindestan bi şiklekî cuda tê meşandin. Di vê tevlîhevî û gengeşiyê de, dijminê qedîm ê gelê Kurd kêm maye were têkbirin. Şervanên azadiya gelê Kurd, tevî hemû mercên giran ên heyî, li dijî dewleta dagirker ev çil sal in bi saya welatparêziyeke bê hempa ya gelê Kurd şer dikin. Mercên Şerê Cîhanê yê Sêyemîn, li ser gerîlayên azadiyê têra xwe giranî çêdike. Wekî ku têrê nekiribe bi ser de jî bargiraniya xiyaneta Malbata Barzanî...

Em nakevin nav dahûrandina nazarî ya xiyaneta vê malbatê. Jixwe pir jî ne hewce ye. Çima? Ji ber ku her tişt li ber çavan e. Serdem ne serdema Rayberan e ku piştî bi salan hin tişt derkevin holê. Çawa ku Rayber û Zeynel pê mijûl bû ku serê pîroz ê Elîşêrê serlehengê Qoçgîrî û şêrejina Zerîfe jê veke û biavêje tûrê li pişta xwe da ku teslîmî leşkerên Tirk bike, niha jî Mala Barzanî hê mehên destpêkê yên şerê dawî, dabû li ser rêyên Zandora. Çima? Ji ber ku Osmaniyan nedikarîn berxwedana gerîla bişkînin. Bi rê û dirban jî bi xweşikî nedizanîn. Kê dizanî? Evîndarên welatê xwe gerîla... jixwe ew jî li wir bûn singa xwe bi salan e dabûn ber top û tifingên dagirkeriyê... tî û birçî, bê xew û bi evîndarî... ji Fermandariya Giştî ya Gerîla ferman hatibû ku eger derfetên berxwedanê nemabin ew dikarin bêyî ku ruhê dagirkerî û xiyanetê pê bihese, xwe bidin aliyekî. Tevî vê gerîlayên azadiyê biryar dabûn ku ruhê xwe yê şêrîn teslîmî nav baskên teyrûbazên Zandoreyê bikin. Sal 2021 bû.

Xiyaneta vê Malbata nêviyên Rayberan beşeke mezin kiribû pere û xistibû benqeyên li Ewrûpayê. Em van tiştan ji ku dizanin? Tv24 û Rûdaw!.. Di şaşikên Tv'yên xwe de diketin şikefta Zandoreyê. Ji gerîla re çêr dikirin, xeberên ne xweş ji wan re dikirin! Kî dizane, her hal dema ketibûn ber leşkerên dagirker zirava wan qetiyabû!

Di vê navberê de şer giran bû, dijminê gelê Kurd bi alîkariya Malbata Barzanî bi dehan gerîla bi çekên kîmyawî xeniqandin. Dema ku dagirkerî tengav bû, nekarîbû xwe li ber gurzê gerîla ragire, Xêrxwaziya Barzaniyan jêre bûn rê, mewzî û sîber. Herî dawî li Zapê, leşkerên Tirk dema li ber ala vê malbatê di xew re çûbûn, gerîla ruhê wan stand. Lê laşê wan ê genî ket para Malbata Barzanî. Di kamerayên gerîla de erebeyên bi cendekê leşkeran barkirî xwe digihand baregeha dagirkeriyê. Xiyaneta Rayber û Yêzdanşêr li ber vê xiyanetê wekî fêrîşteyê Xweda ku bi heft avên zemzemê hatiye şûstin dimîne.